Minden

**Stadt Minden** . Postfach 3080 . 32387 Minden

**Stadt Minden** Der Bürgermeister

1.21 Schulbüro

Ihr Schreiben vom:
Ihr Zeichen:
Mein Zeichen: Ti
Dienstgebäude: Kleiner Domhof 6
Zimmer: 1.10
Telefon: 0571 89-750
Fax: 0571 89-680
Auskunft: Ramona Timm
r.timm@minden.de

**Qeydkirina zaroka we di dibistana seretayî de ji bo sala 2023/2024**

Malbatên birêz:

Êdî dem hat, zaroka we «Kind_Vorname» ket temenê çûna dibistana mecbûr de. Ji ber vê jî hûn wekû malbat neçar in zaroka xwe di dibistanekê de qeyd bikin.

Da ku hûn zanibin bê li kîjan dibistanê mafê zaroka we yê qeydkirinê heye, li nameya ku me ji were şandiye binerin. Ji bo zaroka we dibistana herî nêzîkî we û navê wê di hindirê çarçofeyekê de were şandin, ew dibistan wê mafê pêşîn ê qeydkirinê bidin we.

Heger we xwest hûn zaroka xwe bişînin dibistaneke din, ew dibe, lê divê cih li wê dibistanê mabe piştî ku zarokên wê tarê hemû hatibin qeyd kirin.

Dibistana Domschule û Primus, zarokan ji tevahiya bajêr qebûl dikin, heger hûn bixwazin zaroka xwe li wir qeyd bikin, wê li wir jî mafê pêşîn ê we be, wek wan wek dibistana ku me navê wê ji were şandiye.

Ji bo qeydkirina zaroka we di dibistana seretayî de, çar gavên giring hene gerek hûn pêk bînin:

- **Nameya ku ji bo qeydkirinê ji were hatiye dagrin û ji mere bişînin:** Bi vê nameyê re, kaxezek ji bo dagirtinê heye, ji kerema xwere wê dagrin û beriya **09.09.2022** bişînin, an di rêya Emailê re an jî bi rêka postê bişînin ji rêveberiya dibistanê re.

  Heger hûn bixwazin zaroka xwe li dibistaneke taybet qeyd bikin wekû (Freie Evangelische Schule, Waldorfschule) an jî hûn bixwazin zaroka xwe li dibistanekê derveyî Minden qeyd bikin, hingê dîrek bi wê dibistanê re têkevin têkiliyê de, lê dîsa jî divê hûn vê kaxezê dagrin û li me vegerînin.

- **Hevdîtina qeydkirinê:**
  Ew dibistana ku navê wê ji were hatiye şandin, wê dibistan bi xwe jî were agahdar kirin ku hûn dixwazin zaroka xwe qeyd bikin, ji ber wê jî wê ew ji bo we saetekê veqetînin da ku rû bi rû bi were biaxivin. Ev yek jî wê di payizê de pêk were, wê hingê divê hûn û zaroka xwe bi hevre herin dibistanê.

- **Biryara qebûlkirinê:**
  Piştî ku hevdîtin pêk were, rêveberiya dibistanê biryara xwe dide ka wê zaroka we qebûl bike an jî na, Ev biryara dawî wê heya dawiya meha yekê li ber destê we be.

- **Kontrola tendurustiyê:**
  Hemû zarokên ku wê herin dibistanê, navenda tendurustiyê ya Minden-Lübbecke wan kontrol dike, ji bo vê yekê jî wê nameyek ji were ji wê navendê were di wê nameyê de roj û saeta kontrola zaroka wê hatiye destnîşan kirin.

Ji bo agahiyên bêtir, ev pirtûka ku me ji were şanidiye bixwînin, an jî rûpela me ya Internêtê vekin: www.minden.de/schulanmeldung.

Di gel rêz û silavan de

Ramona Timm

Tûrik: Bi vê nameyê re wê kaxeza ji bo dagirtinê, kaxeza agahiyan û pirtûkek ji bo agahiyan ji we re were.

Ev kaxez hemû tenê bi Almanî hene.